

Spîtama û Mantiqa Tirkî-2

Di beşê ewil ê vê nivîsê da, ji alîyê Tirkî va ez li ser mantiqa hinek hevokên romana Spîtamayê sekinîm. Di vê nivîsê da, hin nimûneyên dîtir he ne. Herwiha di romanê da gellek şaşîyên mantiqî jî he ne, lê ew ne mijara vê nivîsê ne. Tiştê ecêb, mirov wextê zimanê Spîtama û berhemên din ên Rênas Jîyanî rûqalî hevdu dike, mirov fam dike ev ziman, ne zimanê Rênas Jîyanî ye, zimanê berhemên wî yê din ne bi vî awayî ye. Gelo Tirkîyê, çima tesîr li romana Spîtamayê kir? Gelo Spîtama, çima bi Kurmancîyeka xêşîm hat nivîsîn? Gelo Rênas Jîyan çima li vê yekê varneqilî?

Ji alîyê mantiqa Tirkî va, hin hevokên din ên romanê ev in:

87.

Mirov çiqasî xurt û xwedî derfetên fireh be jî... (112)

İnsan ne kadar güçlü ve geniş imkânlara sahip olsa da...

Mirov çiqasî xurt be û derfetên wî he bin jî...

88.

Di vir de Maîdyo dest bi girî dike... (114)

Burada, Maidyo ağlamaya başlıyor...

Û Maîdyo digirî...

89.

Piştî xebateke mezin û giran a deh salan.. (115)

On yıllık büyük ve ağır bir çalışmadan sonra...

Piştî xebateka hêja a deh salan... Piştî xebateka giran a deh salan...

90.

Spîtamayî karîbû têteta teşqeyên giran... (115)¹

Spitima büyük olaylara girebilirdi...

Dibû ku serê Spîtamayî têteta belayên giran...

91.

Wî ez ji xwe re ~~mînak~~ diqirtim... (123)

O beni kendine örnek alıyordu...

Wî yê ez ji xwe ra bikirima rêber... Wî yê bidaya pey şopa min. Ew ê li dû min bihata...

92.

Ji bo wî ~~xalêkî~~ pîrr qirîng bû... (123)

Onun için önemli bir madde idi...

Ev tişt, ji bo wî muhîm bû. Ji bo wî ev tişt pîrr bi qîmet bû...

¹ Di pirtûkê da hevok ji bo rewşa "îxtîmalê" ye, di Kurmancî da ji bo vê rewşê lêkera "bûn" û peyva "belkî" yê tê bikaranîn. Lêkera "karîn"ê îxtîmalê çênake.

93.

Ev mijar hatibû girtin, mijareke din vebibû... (125)²

Bu konu kapanmıştı ve başka bir konu açılmıştı...

Ev mesele hal bû, li ser meseleka din xeber didan... Ev mesele hal bû, qala tişteki din dikirin...

94.

Ger sibêro pirsqirêkek derkeve... (125)

Eğer yarın öbür gün bir sorun çıkarsa...

Ger sibê ro teşqeleyek çêbibe...

95.

Ez bi te re derketime rêya mirinê... (125)

Ben seninle ölüm kalım yoluna çıkmışım...

Min ji bo te mirin daye ber çavan...

96.

Tiştêki neyînî bîne serê min... (127)

Başıma olumsuz bir şey getirirse...

Tiştêki xirab bîne serê min... Tiştêki bîne serê min...

97.

Ji yekî tenê hezkirin baş e lê ne bes e, ji yekî tenê bawerkirin baş e... (128)³

Tek bir kişiyi sevmek iyidir ama yetmez, bir kişiye tek inanmak iyidir...

Mirov ji yekî tenê hez bike tişteki baş e, lê ne bes e, ji yekî tenê bawer bike tişteki baş e...

98.

Siûdeke pîrr mezin bû ku herdu çêlik sax filitîbûn... (129)

İki yavrunun sağ kurtulması büyük bir şanstı...

Çêlik bi siûd bûn ku sax filitîbûn... Xwedê li gunehên çêlikan nêrîbû ku sax filitîbûn...

99.

Ev çareseriya saxlem hatibû guhê Maîdyo... (131)

Bu sağlam çözüm Maidyo'nun kulağına gelmişti...

Maîdyo ev çareserîya hanê bihistibû. Maîdyo hay ji vê çareserîyê he bû. Ev çareya bi ber guhê

Maîdyo ketibû...

100.

Lê hesab vaîf derketibû.. (131)

Ama hesap ters çıkmıştı...

Lê hesabê wan li hev derneket... Lê hesabê wan şaş derket...

101.

Welatê xwe kûr kûr bêhn kir... (134)

Vatanını derin derin kokladı...

Welatê xwe têr bêhn kir. Welatê xwe baş bêhn kir...

² Hevok, ji alîyê avanîya lêkêrê va jî li hev nakin. Yek tebat e, yek lebat e.

³ Ravek, li gorî awayê Tirkî hatîye lêkirin.

102.

Hêdî hêdî Xwowî û zarok hazirî vê yekê kiribûn... (134)

Xwowî ve çocukları yavaş yavaş buna hazırlamıştı...

Hêdî hêdî Xwowî û zarok hînê vê yekê kiribûn... Hêdî hêdî Xwowî û zarok ji vê yekê ra hazir kiribûn...

103.

Spîtama di temenê çil salî de berî zayîna Îsayî... (136)

Spîtama kırk yaşında, isan'ın doğumundan önce...

Spîtama di çil salîya xwe da, berî çêbûna Îsa... Spîtama berî zayîna Îsayî wextê çil salî bû...

104.

Bi mehiyetke fireh li benda Spîtamayî bû... (144)

Geniş bir mahiyetle Spîtama'yı bekliyordu...

Bi tevî heval û hogiran li benda Spîtamayî bû...

105.

Spîtama mirovekî xwezayî bû... (144)

Spîtama doğal bir insandı...

Spîtama li çol û çîyan mezin bûbû. Spîtama ji nav dilê çol û çîyan dihat. Spîtama av û nanê wan deşt û çîyan xwaribû. Spîtamayî zilamê deşt û zozan û çîyayan bû...

106.

Hey bi çavên heyirî li dora xwe dinêre... (144)

Şaşkın gözlerle etrafına bakıyor...

Şaş mabû û li dora xwe dinêrî. Matmayî li dora xwe dinêrî. Hey li dora dinêrî û li wan heyirî dima...

107.

Aciziya xwe ji ser xwe avêtiye û niha guncawê ramanê ye... (145)

Yorgunluğunu üstünden atmış, düşünmeye müsaitti...

Bêhna wî hatîye ber wî û niha êdî dikare bifikire...

108.

Mirovên vir ne pêşdaraz bûn... (145)

Buranın insanları önyargılı değildi...

Tiştên xirab, nedihat ber dilê van mirovan. Ev mirov, ne dilxerab bûn...

109.

Çi zêrr û cewher ji destê xwe revandiye... (145)

Ne altın ve mücevherler kaçırmış elinden...

Çi zêrr û cewher ji destê wî çûne...

110.

Xezeba wan nekişîne ser xwe... (147)

Onların gazabını üzerine çekme...

Berê xezeba wan nede xwe. Xwe, ji xezaba wan bistrîne...

111.

Ne pêkan e ku ew xerabiyekê bike û bi xwe re bikeve nakokiyê... (151)
Kötü bir şey yapıp kendisiyle çelişkiye girmesi imkansız...
Ew ê xerabîyekê neke û bi xwe ra rast be...

112.

Hinekî dibîşire û di hundirê xwe de dibêje... (151)
Biraz gülümsüyor ve içinden diyor ki...
Dibîşire û di dilê xwe da dibêje...

113.

Guneh giran e lê vê xerabiyê ancax dikare Zak bike... (153)
Günahı ağırdır, bu kötülüğü ancak Zak yapar...
Gunehekî giran e, lê vê xerabîyê dibe ku yekî wek Zak bike...

114.

Her wekîdin gelek kirinên ronî pêk bianiyana... (153)
Ve başka birçok aydınlık eylemler yapacaktı...
Her wekîdin dê gellek karên baş bikirina...

115.

Fraşaoştra û Jamaspa sekinî man, deng ji wan çênebû... (153)
Fraşaoştra ve Jamaspa öylece durdular, ses çıkmadı onlardan...
Fraşaoştra û Jamaspa bûn kevir û man, nema deng ji wan derket. Fraşaoştra û Jamaspa lal bûn, deng ji wan bilîya... Fraşaoştra û Jamaspa sar sekinîn û gotin ji wan çênebû...

116.

Tu nabêjî ji ber baranê reviyaye ber zîpikê... (158)
Demek yağmurdan kaçıp doluya tutulmuştu...
Tu nabêjî, ji ber şirrikê çûn ber meZRîbê. Tu nabêjî, ji ber baranê revîn xwe dan ber şirrikê. Tu nabêjî, ji baranê revî li teyrokê qelibî. Çima tu nabêjî ji ber baranê çû xwe da ber meZRîbê...

117.

Li cem mala wî mêvandar ma... (159)⁴
Onların yanın da konuk kaldı...
Li wî bû mêvan. Bû mêvanê wî...

118.

Me her çare ceriband... (162)
Biz her çareyi denedik...
Çi ji destê me hat me kir. Me teksîr nekir, çi ji destê me hat me kir...

⁴ Gelo mirov çawa mêvandar dimîne?

119.

Ger mirov yekî dilvekirî be pir hêsan e ku gotinek kinik an jî tişteki biçûk bibe sedem ku mirov bawer bike... (166)

Eğer insan açık yürekli biri ise kısa bir söz ya da küçücük bir şey insanın kolayca inanmasına sebep olur...

Ger mirov dilsoz be, gotinek yan jî tişteki biçûk dikare bi rehetî bibe sebep ku mirov bawer bike. Ger mirov ji dil be gotinek yan jî tişteki biçûk dikare bibe sebep ku mirov bawer bike...

120.

Ji çî diqewime ev nefreta min? (167)

Bu nefretim neden kaynaklanıyor?

Ev nefreta min ji çî ye? Ev nefreta min ji ber çî ye?

121.

Tu ne ez im, tu ji min î, lê tu ez im... (167)

Sen ben değilim, sen bendensin, ama sen benim...

Tu ne ez î, tu ji min î, lê tu ez î...

122.

Wî ez zindan kirim... (168)

O beni hapsetti...

Wî ez xistim zinadanê. Wî ez avêtim hepsê...

123.

Biqasî serê neynûka wan ji wan re ne girîng e... (168)

Onlar için tırnağın ucu kadar önemli değil...

Biqasî serê derzîyê jî ji wan ra ne girîng e. Ji bo wan nake serîyek pîvaz. Bi qasî neynûka wan jî qîmetê wan li ber çavên wan tune ye...

124.

Ez nêzîkî wî me; wî diçavdêrim... (168)

Ben ona yakınım; onu gözlemliyorum...

Ez nêzê wî me û çavdêriya wî dikim. Ez nêzê wê me; bala min li wî ye...

125.

Ya wî yê tu xelas bikirayî ya jî xwe bida girtin ji bo ku êşa te parve bikira... (169)

Ya seni kurtaracaktı ya da kendini de tutuklatacaktı senin acını paylaşmak için...

Yan wî yê tu xilas bikira yan jî xwe bidaya girtin ji bo ku bibûya hevalê te. Yan wî yê tu xilas bikira yan jî xwe bidaya girtin ji bo ku êşa te sivik bikira...

126.

Ew pirr baş temîn kirin û ew xistin rê û rast berê wan da Medyayê... (170)

Onu iyi temin ettiler, onu yola koydular ve yönünü Medyaya çevirdiler...

Ew pirr baş temîn kirin, ew bi rê kirin û rast berê wan da Medyayê...

127.

Gava ku zarokan li bavê xwe bipirsîya wê çîrokek ~~îca~~ bikira û ew bixapadana... (170)

Çocuklar babalarını sorduğunda onlara bir şey uyduruyordu...

Gava ku zarokan li bavê xwe bipirsîya, dê tişteke li hev bianîya û ew pê bixapandina. Gava ku zarokan li bavê xwe bipirsîya dê derewek bikira û ew pê bixapandina...

128.

Jamaspa ligel ciwanîya xwe karîbû ewqasî xwedî zanîn kesayeteke bilind bûya... (171)

Jamaspa genç olmasına rağmen, bilgi sahibi ve yüksek bir kişilik olabiliyordu...

Jamaspa ligel xortanîya xwe yekî kemilî û zana bû. Jamaspa ligel ciwanîya xwe xwedî zanîn bû û şexsîyeteke mezin bû...

129.

Ev jî ji wan carên xapînok yek bûya... (171)⁵

Bu da o yalan anlardan birisi olsaydı...

Ew jî yek ji wan gotinên xapînok bûya...

130.

Pel di nav tîliya xwe ya serî û ya îşaretê de rast û çep fitiland... (172)⁶

Yaprağı baş parmak ve işaret parmağı arasında sağa sola çevirdi...

Pel di nava tîliya xwe ya mezin û ya şehadetê da bir û anî...

131.

Jamaspayî bersiva xwe stendibû... (173)

Jamaspa cevabını almıştı....

Jamaspayî bersiva xwe girtibû...

132.

Ku ~~rewşa~~ Spîtamayî baş bûya û ew di ewlekariyê de bûya... (174)

Spitama'nın durumu iyi olsaydı ve güvenlikte olsaydı...

Ku rewşa Spîtamayî baş bûya û tu bela li ser sera tune bûya. Ku halê Spîtamayî baş bûya û star bi serê wî ketibûya...

133.

Di demên pêş de Maîdyo carinan di nav re hat Baktriyayê... (174)

İleriki zamanlarda, Maidyo bazen Baktriya'ya...

Piştî wextekî Maîdyo carinan dihat Baktriyayê...

134.

Mûcîze, ji bo ku mirov bawerîya xwe talaq û ~~asteng~~ bike hincetek e... (177)

Mucize insanın inancını erteleyip sorun yapması için bir bahanedir...

Ji bo ku mirov bawerîya xwe pê neyîne, mûcîze hincet in...

⁵ Ev hevok, ji alîyê sentaksê va jî li Kurmancî nake.

⁶ Gelo bi Kurmancî dibêjin tîliya "serî" û ya "îşaretê?" Xelkê, "Qilîç-qilîçik, mamelîç-babelîç, dergevan-natorvan-silima dizan, eşhedok, spîkuj-tîliya mezin-beranî-girêkî..." gotîye, lê awayê "serî" û "îşaret"ê nîn e.

135.

Her tişt di ronahiyeke mezin de bû... (178)

Her şey büyük bir aydınlık içindeydi...

Her der ronî bû. Ronahîyê, her tişt kiribû bin hukmê xwe...

136.

Derfetên wî pîrr fireh bûbûn... (180)

Olanakları çok genişlemişti...

Derfetên wî pîrr bûbûn...

137.

Dijminên Spîtamayî êdî ew ~~gîrîngîr~~ digirt û wan bêtir hesabê wî dikir û bi çavekî mezin lê dinêrî...

(180)

Spitama'nın düşmanları artık onu önemli tutuyordu ve onun da hesabını yapıyorlardı ve ona büyük bir gözle bakıyorlardı...

Dijminên Spîtamayî êdî bêtir hesabê wî dikir, li ber çavên wan bûbû yekî mezin...

138.

Rojên wî xweş û mişt derbas dibin... (183)

Günleri güzel ve dolu dolu geçiyordu...

Rojên wî xweş û geş derbas dibûn...

139.

Temenê Xwowîyê yê li Baktriyayê xweş û bextewar derbas dibû... (189)

Xwowî'nin ömrü Baktriya'da güzel ve mutlu geçiyordu...

Jîyana Xwowîyê li Baktrîyayê xweş û bextewar bû...

140.

Paleyekî navê wî Varaza ~~hevpeyvîn~~ herduyan dibirre... (193)

Varaza adında bir tarım işçisi, onların konuşmasını kesti...

Paleyekî bi navê Varaza xebardana wan birrî... Paleyê ku navî wî Varaza bû, peyva wan birrî...

141.

Lê bila di navbera me de bimîne... (197)

Ama aramızda kalsın...

Bila ji xeynê me kes pê nezane. Bila di nav me da bimîne...

142.

Aqilmendekî wî yê baş nîn e ku wî ji kirinên wî yê ~~çewt~~ vegeirîne... (197)

İyi bir akil insanı yok ki onu yanlış emellerinden çevirsin...

Mirovekî aqilmend li balê nîn e ku wî ji şaşîyên wî vegeirîne. Mirovekî zana li balê nîne ku wî ji rêya şaş vegeirîne...

143.

Têkiliyên xwe ji Medyayê birrîn û piştgirîya xwe sekinand... (198)

Medya ile ilişkilerini kesti ve desteğini durdurdu...

Bi Medyayê ra neda û nestend û êdî piştgirîya wê nekir. Nema bi Medyayê re da û stend û nema piştgirîya wê kir...

144.

Hevalbendiyeke pirr baş bi dewleta Babîlê re ava kiribû... (198)

Babil devletiyle sıkı bir arkadaşlık kurmuştu...

Bi dewleta Babîlê ra dostanîyeka baş çêkiribû. Bi dewleta Babîlê re dostanîyek baş, danî...

145.

Wek eşîra Hûyaonayan eşîreke pirr tarî û kevneperest û bi baweriyên berê pirr jidiyayî girêdayî ye... (202)

Huyaonayan aşireti gibi karanlık ve gerici ve eski inançlara sıkı bağlıydı....

Wek eşîra Hûyaonayan pirr tarî û kevneperest û pirr bi ser bi bawerîyên berê va ye...

146.

Divê her qirik tehma şûrê me binase... (203)

Her boğaz kılıcımızın tadını tanımalı....

Divê her qirik şûrê me tahm bike...

147.

Ev şerr ne şerrekî ji rêzê yê navbera du dewlet... (209)

Bu savaş iki devlet arasında geçen sıradan bir savaş...

Ev ne şerrekî sivik e. Ev ne şerrekî virda wê da ye...

148.

Barana ku do bariyabû li erdê hê baş zuha nebûbû... (213)

Dün yağan yağmur, yerde daha kurumamıştı...

Ji ber barana ku do barîya bû erd hîn jî şil bû...

149.

Spîtamayî erê wek temen di salên xwe yê şêstî de bû û hinekî kal bû... (214)

Evet, Spıtama yaş olarak altmışlı yaşlardaydı fakat biraz yaşlanmıştı...

Spıtama, di şêst salîya xwe da bû lê hinekî kal bû...

150.

Artêşa wî her ku dihere windahiyên mezin dide... (217)

Ordusu gün geçtikçe ağır kayıplar veriyor....

Her ku diçe leşkerên wî bêtir tên kuştin. Eskerên wî her ku diçe kêm dibin...

151.

Gava ku alîkariya wan têrê nedikir û rewşa wan tenik dibû û diket xetereyê... (217)

Yardımları yetmediğinde, durumları çok hassas olup tehlikeye düşüyordu....

Gava alîkarîya wan têrê nedikir, rewşa wan xirab dibû û diket talûkê...

152.

Ceng pirr germ bûbû... (217)

Savaş çok sıcaktı, ısınmıştı...

Şerr pirr giran bûbû...

153.

Di vê navberê de Jamaspayî ji zû de pirsu ku lê difikirî ~~arasteyî~~ Spîtamayî kiribû... (221)

Bu arada, Jamaspa da çoktandır üzerine düşündüğü soruyu...

Jamaspayî jî ji zû da pirsu ku lê difikirî ji Spîtamayî kiribû...

154.

Li Frenîyê dinêre û alîkariyeke ~~hîşî~~ dide jina xwe... (225)

Freniye bakıyor ve ona hissi bir şekilde yardım ediyor...

Li Frenîyê dinêrî, hêvî û bawerî didayê...

155.

Zak îcar firsend e, Spento-Data tune ye, teqez ez ê wan têk bibim... (232)

Zak bu ser fırsattır, Spento-Dante yok, onları kesin yeneceğim...

Zak îcar keysa me lê hat, Spento-data ne li wir e, ez ê wan perîşan bikim...

156.

Niha herdu li kêleka hev li ser piştta hespan diçûn û dipeyvîn... (233)

Şimdi ikisi yanyana, at sırtında gidip konuşuyorlar...

Niha herdu li kêleka hev li ser hespê xwe bûn û dipeyvîn...

157.

Bajar di demeke kin de şikest û ket destê artêşa Arjataspayî... (234)

Şehir kısa bir sürede kırıldı ve düştü ve Arjataspa ordusunun eline geçti...

Bajêr li ber xwe neda zû şikest û ket destê artêşa Arjataspayî...

158.

Jamaspawek çareya dawî xwe vedizî... (235)

Jamaspawek son çare olarak kendini sakladı...

Jamaspawek herî dawî mêze kir nabe, xwe vedizî...

159.

"Ne ji bo xwe û me û bavê xwe, ji bo wî pêxemberê ku di demê de bavê te, wek te ew zîndan kiribû were şer bike Spento..." (238)

Kendin için, bizim için, baban için değil, zamanında babanın senin gibi hapsedtiği peygamber için gel savaş Spento...

Ne ji bo xwe û me bavê xwe, ji bo xatirê wî pêxemberê ku zemanekî bavê te ew wek te avêtibû zîndanê were şer bike Spento...

160.

Niha wek wî, ~~eynî~~ bêçaretiyê dijî... (239)

Şimdi onun gibi aynı çaresizliği yaşıyor...

Niha ew jî wek wî bêçare ye...

161.

Lê Spento-Data bi şûrê xwe ~~êriş~~ wî vala derdixe... (240)

Ama Spento-Data kılıcıyla hücumunu boşa çıkardı...

Lê Spento-Data bi şûrê xwe, nehîşt derba xwe cî bigire...

162.

Divê wî ji şansê re nehiştâ... (241)

Şansa bırakmaması lazımdı...

Ev ne işê şansê bû, divê tişte bikira...

163.

Êdî jiyana te ya dinyê diqede... (243)

Artık dünyadaki yaşamı sona eriyor...

Êdî nan û ava wî li dinyê qedîya...

164.

Mirinek dubare û du qat bû... (243)

Tekrar eden iki kat büyük bir ölüm...

Mirineka giran û zor bû...

165.

Ji ber ku êşa wî miriyê ewqasî zor e û tehemul nabe mirov mecbûr dimîne ku wî miriyê dîsa di hundirê xwe de bikuje... (243)

O ölünün acısı o kadar zor ki, tahammül edilmiyor, insan mecburen o ölüyü içinde yine öldürmek zorunda...

Ji ber ku êşa mirina kesê ku mirov jê hez dike ewqasî zor bû û mirov tehemûl nedikir, mirov ji mecbûrî ew kesê mirî dîsa di dilê xwe da dikuşt...

Herwiha hinek hevokên ku gumanên mirovî ji wan he ne ev in:

Mirov ji dûranî jî dikare bawer bike... (101)

İnsan uzaktan da inanabilir.

Hesp çûye li qeraxa çê m li ser qîyê diçêre... (113)

At dere kenarında çayırdan otluyor.

Ez di dilê wî de mêvanekî mayînde bûm... (113)

Ben onun gönlünde kalıcı bir misafirdim.

Ezman zelal bû, ewrên wek berfê spîboz li ezmên xuya dibûn... (114)

Gökyüzü açıldı, kar gibi beyaz bulutlar gökyüzündeydi...

Nefreta bêkontrol însên ~~têk dibe...~~ (132)

Kontrolsüz nefret insanı mahfeder.

Hemû pêwîstiyên wî bibersivîne... (141)

Bütün ihtiyaçlarını cevapla...

Lê ew bersivê nadin vê hezkirina te... (167)

Ama onlar senin bu sevgine cevap vermiyorlar.

Ev hezkirin vajî dibe û vediquhere nefretê... (167)

Sevge tersine dönüyor ve nefrete dönüyor.

Ev ji bo wî pirsqirêk e yan na... (167)

Bu onun için sorun mudur yoksa...

Li hewşa xênî bi qavên sivik dimeşyan... (171)

Evin avlusunda hafif adımlarla yürüyorlardı....

Dem û sebrê telkînî Maîdyo dike... (173)

Zamanı ve sabrı Maidyo'ya telkin ediyor...

Piştî ku ew li hev dikin û gotina xwe diqedînin diçin alîkariya... (174)

Onlar anlaştıktan sonra, sözlerini bitirip yardıma...

Û wî li hemberî civat û civakê mafdar derxim... (178)

Ve onu topluluk ve toplum karşısında haklı çıkarayım...

Avê vedixwe, ava ku bi ser riha wî de dirije di tavê de dibiriqe... (192-193)

Suyunu içiyor, sakalına dökülen su güneşte parlıyor...

Ev ji bo me erênîyek e... (209)

Bu bizim için olumlu bir şeydir...

Fraşaoştra bi Viştaspayî re bi awayekî pîrr konsantre xal bi xal, mû bi mû li ser plansaziya herbê daqûl dibû, hûr dibû... (209)

Fraşaoştra, Viştaspay'la konsantre bir şekilde, madde madde savaş planı üzerine eğildi.

Viştaspa ketiye xetê û qebûl nake... (231)⁷

Viştaspa hataya düşmüş ve kabul etmiyor...

⁷ Ev biwêj, heger ji bo "rik"ê hatibe bikaranîn rast e, lê ji bo "şaşkirin"ê hatibe gotin şaş e.